Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1234 29-Berfanbar-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Huner mîna deryayeke bêdawî ye

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Wênesaza jin Jînda Qiço diyar kir ku wênesazî ji bo wê hêviyeke ku bi riya wê re rengê jinê dide diyarkirin û wiha got: "Huner mîna deryayekî bê dawî ye, pêwîste mirov xwe pêş bixe û gavên mezin biavêje".**



Jînda Qiço keça bajarê Amûdê ye lê di 1'ê Pûşbera sala 1983'an de li Helebê jidayîk bûye. Li Helebê xwendin û zarokatiya xwe qedandiye. Beşê Darayî li Hesekê tomarkir lê derfet nebû ku berdewam bike, lewma bidawî nekir. Niha jî li bajarê Qamişlo di Hîlala Zêrîn de mamosteya wênesaziyê ye.
Di derbarê jiyan û astengiyên ku rastî wênesaza jin Jînda Qiço hatine, ew ji Rojnameya me re axivî.


**Huner bi şoreşa jinê re dest pêkir**



Jînda Qiço da zanîn ku wê ji zarokatiyê ve ji wênesaziyê hezdikir lê ji ber ku qedrê hunerê di bajar de kêm bû û derfet nebû, ew rastî astengiya dihat, lewma wê biryar da ku ew bi xwe xwe fêr bike û bibe mamoste ji bo xwe û wiha got: "Dema mirov xwedî xwestek be wê bikaribe gavên pîroz bavêje û bibe hêz ji bo xwe. Beriya Şoreşa 19'ê Tîrmehê tu kesî qedir nedida hunerê û bi çavekî piçûk lê dinêrîn. Lê piştî Şoreşa jinê êdî huner jî dest pê kir û bû xwedî rol di civakê de. Min xwest ez gavekî ber bi pêş de biavêjim û ew wênesaziya ku ji zarokatiyê ve bi min re ye, vejîn bikin û ji derdorê re ragihînim. Dema min xwendina xwe ya darayî rawestand, êdî min dest bi wênesaziyê kir. Min bi hemû hewildanên xwe xwest ku ez di tabloyên xwe de rengê jinê bidim pêş. Ji ber ku jin çiqasî bi hêz û xwedî îrade be jî lê hertim dimîne ya hestiyar, lewma ev hest di hemû tabloyên min de di çavê jinê de tê xuyanî kirin. Di heman demê de hin tabloyên min hene şax têde ne, li cem min şax tê wateya vejînkirin û nû avabûnê, lewma her tabloyek li ber dilê min jiyaneke nû ye."

**Xêzkirina xeyal bi riya hunerê**

Jînda Qiço axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: "Wênesazî ji bo min pir pîroz e, ji ber vê yekê min zarokên xwe jî fêr kirine ku tabloyan xêz bikin û ez hertim destekê didim wan da ku pêş bikevin. Sala 2023'an de ez tevlî pêşengeha wêje û hunera jinê bûm, ez ya sêyemîn derketim ev yek ji bo min bû moral û min ev rê berdewam kir. Ez niha vê hêzê didim zarokan da ku ew jî xeyalên xwe xêz bikin. Di heman demê de ez li Hîlala Zêrîn jî mamosteya wênesaziyê me. Ez bi hêvî me ku rojekî ji roja şagirtên min bibin wênesazên navdar û ez wê keda xwe bibînim. Daxwaza min ew e ku huner deha zêdetir bibe xwedî bingehek hîn xurtir û deha zêdetir destek dayîn ji bo wê were dayîn."



# Li gundê Jinwarê rojek...

**Belê ev der Jinwar bû. Jinên ku li vê derê dijiyan, li hemberî paşverûtiyên li ser wan hatine ferzkirin dixwestin ji nû ve biwelidin. Her yek ji wan xwedî çîrokek bû. Her yek ji wan ji netew an jî baweriyek cuda bû.**



Hewaya hûnik ji xakên Mêrdînê rûyê me diferikand. Bêhneke azad û xweşik ji hinaseyê me diket nava dilê me. Em ketibûn gundê Jinwar. Gundekî ku bi destên jinan hatiye avakirin bi heriya sor, mal hatine çêkirin. Bêhna heriya sor a muhteşem bi bêhna jinê re dibû yêk. Li vî gundî tenê jin dijîn. Dema ku em di her gava xaka wê de dimeşiyan kelecanek dilê me dorpêç dikir. Me jî dilê xwe berda nava herikandina kelecana xwe.
Dengê avê di guhên me de mîna dengê kêliyên azadiyê bû. Me hestên xwe ber bi vê germahiyê ve berdida. Kulîlkên curbecur bi destên jinan hatibûn çandin.
Tîrêjên rojê li ser germahiya însanên Jinwarê germahiya xwe zêde dikir. Refên çûkan bi hezaran metre li jorî li ser Jinwarê difiriyan dîmenê pêşandaneke azadiyê çêdikirin. Li ser riyên ji axê yên Jinwarê zarokan dest dabûn hev û digirnijîn... Heçku ji nû ve diwelidîn... Şêne di destên jineke Erep de bû xaka gulistana xwe paqij dikir. Ciwanan li ser riyên bi ax sohbet dikir û dimeşiyan. Sewal kêfxweş bûn. Mamosteyên Şirîn ji bo ku zarokan perwerde bike ber bi dibistanê ve ketibûn rê.

**Belê ev der Jinwar bû**

Jinên ku li vê derê dijiyan, li hemberî paşverûtiyên li ser wan hatine ferzkirin dixwestin ji nû ve biwelidin. Dixwestin ji nû ve bijîn ji ber wê hatibûn gel hev û ev gund ava kiribûn.
Her yek ji wan xwedî çîrokek bû. Her yek ji wan ji netew an jî baweriyek cuda bû. Lê ev qet ne girîng bû. Carna zimanê hev jî fêm nedikirin lê ev jî qet ne girîng bû. Ziman wan di nirxên jinbûyînê de dianî gel hev. Kêfxweşî, xemgînî, kelecana her yekê ji wan bi hêza ku ji hev girtibûn ve bûbû yek. Mînak yek ji destê DAIŞ'ê hatibû rizgarkirin a din ji zilma hevjînê xwe hatibû rizgarkirin lê hemû jî di xalekê de dihatin cem hev û li Jinwar bi cih bibûn. Xwe bi felsefeya Rêber Apo ve ji nû ve zindî dikirin ber bi xwebûnê ve dimeşiyan. Her çendî şêniyên yekemîn ên Jinwarê nebin jî ew her dem bi vê kelecanê tevdigeriyan. **NÛ JINHA**

Sudoku: Bersiv 20

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 21

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 4 | | 6 | |
| | 4 | | 9 | 8 | 1 | | 2 | |
| 5 | | | | | 3 | 8 | | |
| 8 | | 5 | | | | | 1 | 6 |
| | | 4 | | 2 | | 7 | | |
| 7 | 3 | | | | | 5 | | 2 |
| | | 6 | 4 | | | | | 1 |
| | 5 | | 3 | 9 | 7 | | 8 | |
| | 7 | | 6 | | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Belayê, min çavên reş û belek ji te re kil dane:**
- Ez ji bo şer amade me; tu bêminet î; eger tu şer dixwazî, ez ji zû ve dixwazim.
**Bêminetî ye:**
- Tişta ji destê wî tê bila bike; ez pakiyê jê nakim.
**Bêminet e:**
- Tişta ji destê wî tê bila bike; ez pakiyê jê nakim.
- Bêminet e; pêwîstiya wî bi ti kesî nîne.
**Cihê destê te bigihiyê serê xwe jî bêxiyê:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te bê bike.
**Dehên te jî li ser nehên wî:**
- Tu bêminet î.
**Destê te ji te re ye:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te tê bike; ez pakiyê ji te nakim.
**Devera destê te heriyê lingê xwe jî bixiyê:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te bê bike.
**Emê bibînin ka kî berx e kî beran:**
- Emê bibînin ka kî mêr e; emê bibînin ka wê kî bi ser bikeve kî li bin; tu bêminet î.
**Ev ev e; te divê li ber be, te divê ji ber be:**
- Ka tu çawa dixwazî wisa bike; ez lava ji te nakim; tu bêminet î.
**Ev qoça te/ha ev qoça te/ ev qoçê te:**
- Çi ji destê te tê bike; tu bêminet î.
**Her kes kurê bavê xwe ye:**
-Tu bêminet î; tişta ji destê te bê bike.
**Hirç hat va rez diz hat va ez:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te tê bike; ez ji her tiştî re amade me.
**Ji bavê xwe ve bêminet e:**
- Tişta ji destê wî tê bila bike; ez pakiyê jê nakim.
**Ji piran pir ji hindikan qutebir/ ji piran pir ji hindikan hindik:**
- Ku hûn pir in wê ji we pir biçin, em hindik in wê ji me hindik biçin, ango hûnê ji me pirtir zererê bibînin, hûn bêminet in.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## KNK: Pêwîste partiyên kurdî bê nakokî tevlî konferansa netewî bibin




Endamê KNK'ê, Ebdilîlah Erebo diyar kir ku armanca Konferansa Kurd ew e ku nêrîneke yekgirtî ji bo yekrêziya kurdî ji hemû aliyên kurdan kom bike, lewma jî divê partiyên siyasî bê nakokî tevlî bibin.**R-4**


## Akademiya Civaka Demokratîk; cihê xwenaskirin û zanistê ye




Di pêşxistin û rêxistina civakê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rola Akademiya Civaka Demokratîk sereke ye. Di nava salekê de 1500 kes tevlî perwerdeyên girtî yên Akademiya Civaka Demokratîk bûn, herwiha 200 kes jî tevlî perwerdeyên demkî û vekirî bûne.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1234 29-Berfanbar-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bêwate be'



Hevseroka Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl diyar kir ku civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bêwate be, wê civakeke sexte û binxistî be, lê dema jin civakê bi rê ve bibe wê civakek bi exlaq û serkeftî ava bibe.**R-2**

# SERKEFTIN BI HEVGIRTINÊ PÊKAN E

Piştî hilweşîna rêjîma Baas û hatina hikumeta demkî ya ser bi HTŞ'ê ve li desthilatdariya Sûriyê, di heman demê de domandina êrişên dagirkeriya Tirk li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo tevahiya gelên Sûriyê qonaxeke pir hestyar û xeternak dest pê kir. Ji ber wê jî, ji bo avakirina Sûriyeke pirreng û demokratîk ku mafê netewî û demokratîk ê gelê kurd û tevahiya gelên Sûriyê tê de parastî be, yekkirina yekrêzî û helwesta kurdî pir girîng e.**R-3**





## Armanca Hîlala Zêrîn parastina çand û hunera kurdî ye



Rêvebera Hîlala Zêrîn a bajarê Qamişlo Roken Mihemed diyar kir ku Hîlala Zêrîn rojana di nava tevgerê de ye û armanca wan ew e ku tevlîbûna zarokan ji nava xebatê re zêde bibe û zarok zarokatiya xwe jiyan bikin û gel dûrî çand û hunera xwe nekeve.**R-7**

## Mîrateya Apê Mûsa; Şehîdên pênûsa azadiyê



Her şehadetek ku tê jiyan kirin mirov pê diêşe. Lê hin kesayet hene ji bona dest ji doza azadiyê bernedin canê xwe feda kirin, rê nedan tu kesî dengê wan qut bike û pênûsa wan bişkine. Wan her dem dengê rastiyê ragihandin û heqîqet nivîsandin.**R-5**



**Ji 2024'an ber bi 2025'an ve**
Ahmet Aktaş R-4

# ‘Civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bêwate be’

Hevseroka Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl diyar kir ku civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bêwate be, wê civakeke sexte û binxistî be, lê dema jin civakê bi rê ve bibe wê civakek bi exlaq û serkeftî ava bibe.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya ku di sala 2012’an de ji bajarê Kobanê destpê kir, gelê herêmê û bi taybetî jinan ber bi pêvajoyeke nû ve bir da ku ber bi jiyaneke azad, demokrat û wekhev de biçin. Di 13 salên ji aloziya Sûriyê de, jinan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê nîşan dan ku dikarin şoreşê û civakê birêve bibin. Her wiha gelek destkeftî bi saya jinan hatin bidestxistin. Jinên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji tevahî cîhanê re bûn mînak. Dewleta Tirk û komên çete destkeftiyên jinan ji xwe re li hemberî polîtîkayên xwe yên qirker ên li dijî jinan weke xeteriyekê dibîne. Ji ber vê yekê naxwazin jin di nava rêveberiya sîstema civakê bigire, her diwazin ku jin di tarîtiyê de be. Lê jinên herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê ne jinên berê ne ku koletiyê qebûl bikin, ew ê her riya têkoşîn û berxwedanê esas bigirin. Her wiha her bi rengekî



dewamî êrişî gelê herêmê, jinan û projeya demokratîk dike.

Derbarê parastina mafê jinê Hevseroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Rohat Xelîl ji Rojnemeya me re axivî.

Rohat Xelîl di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Di demên berê de li gor zanistên şûnwaran digotin ku civaka xwezayî hebû. Di wê civakê de rola herî bingehîn jin bû. Ew jî destpêka mirovahiyê bû. her wiha di wê civakê de nasnameya mirovahiyê hat dest pê kirin. Çawa jin di wê demê de bibû xwedawend û ji bo civaka xwe bibû dayik. Berpisyariyek pir mezin danîbû ser milê xwe û rêvebirtî dikir. Heta ku sîstema zilamê serdest derket û bi tevahî hewldanên xwe xwest ku jin binpê bike. Bi hezaran jinên bi vî rengî hene ku rastî kiryar, plan û siyasetên qirêj yên zihniyeta zilamê serdest hatin.”

**‘Jin êdî bû pêşengê jiyanê’**

Rohat di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku jin êdî di her qada civakê de cih girt û nasnameya xwe vegerand û wiha domand:”Bi Rêxistinkirina Tevgera Azadiyê re jin êdî jiyana xwe zinîdî kir. Zilamê ku jiyana jinê bê wate û ruh hiştibû Tevgera Azadiyê wate û ruh li jiyana jin vegerand. Jin êdî di her qada civakê de cih girt û nasnameya xwe vegerand, bi saya keda ku gelek hevalên me yên di Tevgera Azadiyê de cihê xwe digrin, jin ji nûve jiyana xwe birêxistin kir. Ev jî tevahî di bin fikrê Rêber Apo de hatiye organîzekirin. Rêber Apo zanîbû ku wê her kes li dijî wî rabe, lê ruxmî wê Rêber Apo ev doz kir ramanc û li ser vê dozê gavek bi paş de neavêt. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava jin nema jina berê ya di bin destê zilamê serdest ye. Jin êdî mafê xwe nas kir û serî li hemberê her zilamekî serdest hilda. Şoreşa ku hat destpêkirin bi navê Şoreşa Jinê hat nas kirin. Her wiha jin rola herî giring di civakê de lîst. Jinê şoreş avakir û bû pêşenga civaka azad. Jin ji hemû milî ve rolek aktîf girt ser mile xwe û bi taybet jî jina kurd ji bona jinên cîhanê tevahî bû pêşng.

**‘Civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bê wate be’**

Hevseroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Rohat Xelîl di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Di vê dema niha de û bi taybet di Sûriye ya nû re pêwîste hilbijartin çêbibin. Hilbijartinên herî rast ew e ku jin jî tê de were hilbijartin û sîstema hevserokatiyê dewam bike. Divê jin di qadên civakî de rolek sereke bilîzin, me jin ji wê tarîtiyê derxist, ji ber vê yekê pêwîste em wê carek din nehêlin ku bikeve bin tarîtiya zilamê serdest de. Civaka ku jin bi rê ve nebe wê ew civak bê wate be. Wê civakek sexte û qelis were avakirin. Lê dema jin di civakekê de pêşengî bike wê civakek bi exlaq û serkeftî ava bibe. Pêwîste jin bibe tişta herî sereke di civak û jiyana gelan de. Jin ew bi xwe bi daxawaze aştî, yekdestî, komînalî û wekhevî ye. Jin her tim jiyana derdora xwe difikire û her tim ji bona jiyanê xwe feda dike. Her wiha sîstema me ya hevserokatiyê gerek her dem dewam bike, ji ber ev sîstem bûye hêz û îrade ji jinên tevahî Rojhilata Navîn re. Di dawiyê de ez dibêjim ku pêwîste rêveberiya nû ya Sûriyê derfetê ji bona jinê bide da ku di hemû warên jiynê de cihê xwe bigre û di asta pêşengiyê de cihê xwe bigre.

# Pergala koperatîfan jiyana hevbeş misoger dike

**Komîteya Aborî ya Kombûna jinan a Zenûbyayê ji dema avabûnê heya niha piştgiriya jinan dike û hişt ku jin aboriya xwe ya serbuxwe bi dest bixe. Komîte bi gelek projeyên weke çandiniyê rola jinan di nav civakê de hîn xurtir dike.**

Komîteya Aborî ya Meclisa Kombûna jinan a Zenûbyayê ya kantona Reqayê-herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji sala 2020’an ve gelek proje dane destpêkirin. Yek ji wan projeyên sereke jî xwedîkirina sewalan, firin û çandiniyê ye. Hejmara jinên ku di van projeyan de kar dikin gihîşt zêdeyî ji sedî 80. Her wiha di vê salê de projeya çandina sebzeyan û pelên tirî hebûn. Rûbera erdên çandiniyê yên ji bo vê pirojeyê tê bikaranîn jî 14 donim e. Li gorî sîstema koperatîfan 4 malbat têde kar dikin.

Rêvebira projeyên çandiniyê ya Komîteya Aborî Wîsaq Ismaîl teqez kir ku sîstema koperatîfan di projeyên çandiniyê de derfetên kar ji gelek jinan û malbatên wan re vekir, her wiha têgeha jiyana hevbeş di navbera herdû zayendan de xurt kiriye.

**Li gor sîstema koperatîfan kar dabeş dikin**

Rêvebera Komîteya Aborî Wîsaq Ismaîl der barê armanca vekirina



projeyên çandiniyê axivî û got: “Armanca me di milê manewî û madî de piştgiriya jinan e. Ji bo rol û beşdariya wan di pêşxistin û xurtkirina aboriya civakî de xurt be em dixwazin jin xwe bispêrin xwe û di nav sektora çandiniyê de cih bigrin. Ji ber bajarê Reqayê bi rûberên çandiniyê dewlemend e û axa wê bi bereket e. Me projeya pelên tirî pêşinyar kir. Rûbera erda me bikar aniye 14 donim e, her wiha me rûberên fireh ji sebzeyan di herdû mewsimên zivistan û havînê de çandiye. Me li gorî sîstema koperatîfan li 4 malbatan belav kiriye. Van projeyan derfeta kar ji 60 kedkarên jin re vekir.”

**‘Jin dikarin ji her cure desthilatdariyê rizgar bibin’**

Wîsaq Ismaîl di berdewamiya axaftina xwe de der barê girîngiya koperatîfan de axivî û wiha got: “Ev sîstemeke têgeha jiyana hevbeş di navbera herdû zayendan de dide nasîn. Jinan bi riya vê sîstemê serxwebûna xwe ya kesayetî û aborî bidest xistin û hîn bi hêztir û xurttir bûn. Her wiha jin di dema niha de dikarin hemû cureyên tundî û desthilatdariyê derbas bikin.”

**‘Projeyên koperatîfan derfetên kar ji gelek jinan re vekirin’**

Xatûn El-Hesen di destpêka avakirina projeyê de cîhê xwe di koperatîfê de digire. Xatûn El-Hesen sedema beşdariya xwe bi van gotinan anî ser ziman: “Piştî min bihîst ku komîteya aboriya jinan li herêmê dest bi gelek projeyên çandiniyê yên taybet bi jinan kiriye û yek ji wan çandina pelên tirî ye ez bi hevjînê xwe re beşdarî projeyê bûm ji bo em alîkariya hev di peydakirina lêçûna xwe ya madî de bikin. Pirojeyên çandiniyê li herêmê jin teşwîq kirin ku xwe bispêrin xwe ji bo rola xwe di bazara kar de xurt bikin. Derfetên kar ji gelek jinan re nêzî cihê malên wan hat peydakirin. Vê yekê jî barê riyên dirêj li ser milê wan sivik kir, her wiha heqdestekî baş jî werdigrin.

**‘Pirojeyên wiha bazara berhemdayîna xwecihî xurt dike’**

Ez bi hevjîn û keçên xwe re ji 6’ê Sibehê ve berê xwe didim nav erd û heta nîvro kar dikim. Paşê em di seatên esrê heta êvarê vedigerin. Ez weke serpereşta projeyê me kar li kedkarên jin belav dikim. Hevjînê min jî cotkar e û parastina erd dike. Ez bi malbata xwe re hemû pêvajoyên çandiniyê dişopînim. Piştî pelên tirî distewin em dest bi rakirina wan dikin û dixin sindoqan ji bo bibin bazarê û bifroşin. Projeyên wiha bazara berhemdayîna xwecihî û kirîna ji dewletên cîran re xurt dike û bi vê yekê aboriya herêmê pêş dikeve.”

**Jin bi riya van pirojeyan xwe spartin xwe**

Xatûn Hesen tevî nexweş e jî kêfxweşiya xwe bi karê xwe û tevlîbûna van projeyan anî ziman û got: “Kar ji bo jinan gelek girîng e ji ber baweriya wan bi wan xurt dike û bi karê xwe dikarin xwe di civakê de îsbat bikin. Divê projeyên li herêmê berfirehtir bibin. Divê projeyên din jî vebin ji bo hejmarek hîn mezintir ji jinan tevlî bibin. Her wiha derfetên kar ji jinên mala xwe xwedî dikin re vebin. Ev proje li herêmê gelekî girîng in û rola wan di xurtkirina sektora çandiniyê û pêşxistina berhemdayîna xwecihî ji herêmê re heye.”

**Zehmetiya kar li ber wan nabe asteng**

Ji aliyê xwe ve kedkara jin Meryem El-Ibrahîm ya 37 salî got: “Ez bi hevjînê xwe re alîkariyê dikim ji bo lêçûna malbata xwe û pêwîstiyên zarokên xwe peyda bikim. Karê di erdên çandiniyê de weke her karî ne bê zehmetî ye. Tevî karê me zehmet e û gelek westan jê re pêwîste jî lê belê ji tunebûnê çêtir e. Ez erdê ji giya û stiriyan paqij dikim û derdora sebzeyan dikolim ji bo av bidim. Dema sebze distewin jî ez wan berhev dikim. Ez bacanên reş, xirtik, îsot, betata û bacanên sor berhev dikim û dixim sindoqên taybet, ji bo paşê bên firotin. Çandina sebzeyan li herêmê dê berhemdayîna xwecihî xurt bike ji ber erda herêmê zengîn e.” **NÛ JINHA**



# Armanca Hîlala Zêrîn parastina çand û hunera kurdî ye

Rêvebera Hîlala Zêrîn a bajarê Qamişlo Roken Mihemed diyar kir ku Hîlala Zêrîn rojana di nava tevgerê de ye û armanca wan ew e ku tevlîbûna zarokan ji nava xebatê re zêde bibe û zarok zarokatiya xwe jiyan bikin û gel dûrî çand û hunera xwe nekeve.


**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Hejmara giropên mezinan ên ku di Hîlala Zêrîn de ne 10 giropin û 28 giropên cuda jî yên zarokane, di sala 2024’an de HÎlala Zêrîn tevlî 100 bernameyên qenalên TV û radiyoyan yên siyasî û hunerî bûye. Di heman demê de serdana hezar malî jî kiriye û gelek semîner û perwerde li ser fikrê Netewa Demokratîk jî hatine dayîn. Gelek pirojeyên taybet bi jinê jî pêş xistin û bûn pirojeyên cîhanî.

Di derbarê kar û xebatên Hîlala Zêrîn a sala 2024’an de Rêvebera Hîlala Zêrîn a bajarê Qamişlo Roken Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**Xebatên sala 2024’an a Hîlala Zêrîn**

Roken mihemed diyar kir ku ji aliyê hunerî zêdetir dixwazin balbikşînin li ser milê çandî ji ber ku hişmendiya netewekî li ser çand û hunera wê tê avakirin û wiha got: “ Çand jî reng, kevneşopî, cil û bergên te dide naskirin. Destpêkê pêwîste em li dîrokê vegerin heya ku wateya navê Hîlala Zêrîn were naskirin. Loma me gelek semîner dan gel û têde şîrovekirina fikrê Netewa derokratîk ya ku bi dîrokê ve girîdayiye. Her wiha çawaniya parastina maf li ser vê axê û bi çand, huner û zimanê xwe rast jiyan bike. Piranî îsal parêznameya sêyemîn û



pêncemîn hat xwendin. Di heman demê de semîner, şano û kilîp hatin dayîn li ser tûndiya ku li ser jinê tê kirin, zewaca temen piçûk û du jinî. Bêhtirî xwe me di van perwerdeyan de hişmendî girt dest ji ber ku di welatekî de pêwîste destpêkê mirov hijmendiyê bigre dest. Ji ber ku çand tenê li ser stran û govendekî nayê guhertin. Her wiha em tînin ziman ku zarok pêşeroja me ne, loma me dibistana xwe ya girûpa zarokan hîn berfirehtir kir, her mamosteyek dihat bi şêwazekî cuda wane didan zarokan, me şêwazê wanedayînê kir piroje û xist destê mamosteyan û wan lêkolîn kir. Minhac hat topkirin û li gorî rasta demsala havînê û demsala zivistanî kar û xebatên zarokan dihatin meşandin. Di dibistanê de jî amûrên wek; keman gîtar, alavên ritim û yên nefest û saz hene, di dema pêş de Xebatên zarokan bi awayekî baş hat derbas kir û bi armanca ber bi 1’ê Îlonê ve roja aşîtiya cîhanî ya zarokan de em festîvala zarokan li dar dixin. Armanc ji vê festîvalê ew e ku zarok him di aliyê hunerî de him jî zarokatiya xwe jiyan bikin daku hinekî dûrî teknolojiyê bikevin û cêja zarokatiyê nas bikin. Festîval îsal bêtirî xwe dewlemend bû, ji ber ku zarokan bixwe li amûrên mûzîkê dixistin.”

**Kar, xebat û astengiyên sala 2024’an**

Roken Mihemed da zanîn ku Hîlala Zêrîn festîvala Şehîd Berçem li bajarê Kobanê lidarxist, ev festîval ser 4 rojan berdewam kir: “Armanca me ji lidarxistina vê festîvalê ew bû ku em çanda hemû pêkhateyan li ser dikeyekî pêşkêş bikin. Ji ber ku belavkirina çanda Netewa Demokratîk û hunera jinan a ku bi fikrê Rêber Apo hatiye rêsandin li ser yek dikê pêşandan xwedî giringiyeke taybete û armanca me ne tenê di milê hunerî de, lê di milê çandî, wêjeyî û şîrovekirinek di milê pênûsa jinê de pêşketine. Her wiha di festîvalê de me xebata karê destan pêşxist, ji ber ku em hertim dibêjin em bixwe aboriya xwe avabikin û pêşbêxin. Di heman demê de gelek piroje hatin çêkirin, hin kes hebû hunera wan karê destan bû, me destek da wan, him pirojeya wan pêşket û him jî sûd jê giritin. Sedemê darxistina vê festîvalê li Kobanê bi armanca ku fikirê Rêber Apo ji wir destpêkiriye û şoreş jî li wir destpêkir. Gelê Kobanê hewcedar bû ku festîvalek bi vî rengî li wir were çêbibe. Ev festîval him manewî bû û him jî wek pirojeyên jin li wir hatin pêşkêş kirin. Di wir de me bal kişand li ser semînera ku çawa Rêber Apo maf daya jinê û pêwîste em vê yekê biparêzin û xwedî li xeta azadiya têkoşîna jinê derkevin.”

Roken Mihemed axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: “Astengiya ku em rastî wê hatin ew bû ku me dixwest ev festîval bibe festîvaleke cîhanî û hin kes ji derve jî werin û em çandeke azad û hunerekî demokratîk pêşkêş bikin. Loma gelek hunermendan amadekariyên xwe kirin da ku tevlî bibin, lê mixabin PDK’ê derfet neda wan ku derbasî Rojavayê Kurdistanê bibin û bû kelem li hemberî huner û çanda neteweke demokratîk. Bû asteng li pêşiya herikîna hunerke azad li Rojava. Herwiha di nav kar û xebatên me de me pirojeya Keziyên Sor jî, ji dîroka destpêkirina wê heya îro girt dest, di asta navneteweyî de jî hat belav kirin û li gor wê spasname jî hat dayîn ku tevî van şert û mercên zehmet pirojeyek bi vî rengî hat çîkirin. Ev yek jî vedgere keda bi sedan kes yên ku cihê xwe di nav de girtin. Her wiha gelek kilîp hatin çêkirin û tevlîbûna bernameyên TV yan çêbû, ji bo rojên taybet wek 27’ê Mijdarê, 15’ê Tebaxê, 8’ê Adarê, 4’ê Nîsanê ,21’ê Adarê kar û xebat hatin kirin. Li ser vî bingehî ev nêzî du sala ye kesên ku dihatin tevlî xebatên me dibûn, me bingehê ekademiyê ji wan re avadikir ku ev nêzî 6 sala ye me xebat dida meşandin ku ekademiyeke xweser were avakirin. Ev yek pêk hat û ekademî li bajarê Hesekê li ser asta cîhanê vebû û bidehan kes ji bajarê Qamişlo tevlî bû da ku bibin xwedî bawername û bikaribin xwe bêtir pêş bixin.”

**Pirojeyên sala 2025’an**

Rêvebera Hîlala Zêrîn a bajarê Qamişlo Roken Mihemed axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: “Di sala 2025’an de em ê perwerdeyên xwe yên fikirî berdewam bikin, di 1 û 2’ê Adarê wê festîvala Huner û wêjeya Jin li darbikeve û wê Hîlala Zêrîn û Desteya Çandê pê rabin. Hewildanên me hene ku em piyano, wênesazî û karê destan jî pêşbixin. Her wiha amadekarî ji bo rojên taybet wê werin kirin wek 8’ê Adarê, 21’ê Adarê, 15’ê Tebaxê, 27’ê Mijdarê û 4’ê Nîsanê. Meha Gulanê wê konfiransa 4’emîn a Hîlala Zêrîn wê li dar bikeve, ji niha ve wê komîte derkevin ji bo sererastkirina rêziknameyê û sererastkirina biryaran.”

# Di ser wefata hunermenda kurd Eyşe Şan re 28 sal derbas bûn

**Navenda Nûçeyan**

Di ser mirina hunermanda nav û deng ya Kurd Eyşe Şanê re ku yek ji navên girîng ên muzîka Kurdî ye 28 sal derbas bûn. Eyşe Şan, hunermenda nav û deng, hunermenda bi kilamên xwe çanda Kurdî parastî û dijî asîmlasyonê bi tena serê xwe li ser piyan mayî. Eyşe Şan ji ber zextên li ser zimanê Kurdî, ji Amedê heya Elmanyayê li pey parastina çanda Kurdî çû. Eyşe Şan di nav gel de wekî “Keybanûya bê tac û text” tê naskirin

Îro 28 sal bi ser wefata hunermenda Kurd Eyşe Şan re derbas dibin. Eyşe Şan di sala 1938’an de li bajarê Amedê ji dayîk dibe. Ji ber bavê Eyşe Şanê jî dengbêje, di nava dîwanên dengbêjan de çavê xwe li dinyayê vedike. Eyşe Şan cara yekê di cemaetên jinan yên li Amedê de bi gotina Îlahiyan dest bi jiyana xwe ya hûnerê dike.

Dengbêja Kurd Eyşe Şan di sala 1938’an de li Amedê ji dayîk dibe. Di 18’ê Kanûna 1996’an de li bajarê Îzmîr yê Tirkiyê bi nexweşiya penceşêrê dikeve û diçe ser dilovaniya xwe. Hûner û dengbêjiya xwe dispêre êşên civak jiyan dikin, rexne li paşverûtiya pergala mêr digire û herî zêde jî li dijî zêhniyeta Tirkperest parêzvantiya çand û zimanê Kurdî dike. Di demeke ku Kurd di her aliyekî de tê înkarkirin de ew bi kilam û hûnera xwe li dijî vê sîstema înkarger û asîmîlasyonîst bi wêrekiyeke mezin disekine.

Eyşe Şan di demeke ku feodalîzm û zextên li ser jinê dijwar de dengbêjiyê dike. Hewldana wê ya yekem a hunerî di cemaeteke jinan ya Amedê de bi gotina îlahiyan dest pê dike. Lê, zextên civakê û paşverûtiya tê ferzkirin nahêle Eyşe Şan li Amedê hûnerê bike. Neçar dimîne berê xwe bide Dîlokê.

Li Dîlokê gava xwe ya yekemîn a hûnerî davêje. Lê, ji ber zimanê serdest Tirkiye di radyoya Dîlokê de du salan stranên Tirkî dibêje. Di sala 1963’an de ji ber pirsgirêkên madî berê xwe dide bajarê Stenbolê û li wir konserên Kurdî û Tirkî dide. Li vir bi strana ‘Ez Xezalim’ deng vedide. Lê piştre kasêta xwe ya yekemîn derdixe. Lê, navdarbûna Eyşe Şanê zextên li ser kêm nake, berovajiyê wê zêdetir dike. Ji ber stranên Kurdî di vê demê de qedexeye, Eyşe Şan êdî nikare bidomîne û berê xwe dide xerîbiyê ango Elmanyayê. Li vir hewl dide hem bijî hem jî hûnera xwe bidomîne. Di vê demê de keça xwe Şehnaz a 18 mehî ji dest dide. Di warê hestî de jî demeke zehmet derbas dike û di vê demê de strana ‘Qederê’ a bi nav û deng derdixe.

Piştî demekî şûnde careke din dixwaze vegere Stenbolê. Lê, jiyana wê ya Stenbolê wek hêvî dike nameşe. Ji ber stranên Kurdî yên dibêje gef lê têxwarin û zext lê tê kirin. Eyşe Şan di vê demê de dayîka sê zarokane. Zarokên wê jî ji ber zextên li ser wê terka dayîka xwe Eyşe Şanê dikin. Eyşe Şan bi tena xwe dimîne.

yşe Şan di sala 1979’an de berê xwe dide paytexta Iraqê Bexdayê. Di radyoya Bexdayê de bi navê Eyşe Şana Elî dest bi stran gotinê dike. Li ser vexwandina waliyê Hewlêrê yê wê demê tê Hewlêrê û konser dide. Li vir fersendê naskirina gelek hûnermend û dengbêjên Kurd dibîne. Bi germî ji aliyê Kurdên hemû deverên Başûrê Kurdistanê ve tê pêşwazîkirin. Li Bexda, Dihok, Kerkûk û Hewlêrê bi hunermendên mîna M. Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Gulbihar, Tehsîn Teha, Nesrîn Şêrwan û gelek kesên din re derket ser dikê û bi hevre ji bo gel konsertan dan. Herwiha bi gelek kesayetî û hunermendên Kurd re hevdîtin pêkanîn.

Ey Şan di nava civata Kurdan da bi navên mîna Eyşana Kurd, Eyşe Şan,




Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eyşana Elî û Ayşa Şan tê nasîn. Di nava jinên Kurd yên hunermend de Eyşe Şan navekî naskirî û weke Meryem Xan, Nersîn Şêrwan, Elmas Xan û yên din şopeke dewlemend a hûnera Kurdî li pey xwe hiştiye ye.

Eyşe Şan stranên gelêrî, siyasî û bûyerên jiyana wê eleqeder dikin, gotiye. Stranên wê yên navdar ku di civaka Kurd de tê zanîn: Cembeliyê mîrê Hekariyê, Mem û Zîn, Lê lê Bêmal, Zerî Heyran, Cemîle, Bêrîvanê, Koçerê, Lawikê Metînî, Meyro, Hesenîko, Derdê Hewiyê an wela te nastînim, Qederê Yar, Xerîbim Dayê, Werin werin Pêşmergeno, Newroz û Welatê min Diyarbekir stranên Eyşe Şanê yên binav û bangin.

Tevî ku gelek dixwast biçe cihê jê dayîk bûye, Amedê jî lê, ji ber zextên civakî nekarî bizivire. Hezkirin û piştgiriya dayîka wê li hember van zextên civakî têrê nedikir Eyşe Şana xwe vegerîne Amedê. Eyşe Şan di dawiya temenê xwede êşên mezin jiyan kir û di nava tenêtî û xîzaniyê de bi nexweşiya penceşêrê dikeve.

Hunermenda nav û deng Eyşe Şan beriya 27 salan di 18’ê Kanuna 1996’an de, li nexweşxaneyeke Îzmîrê de diçe ser dilovaniya xwe. Tevî wesiyet dike, wê li Amedê defin bikin jî li gorî tê gotin ji ber pirsgirêkên madî zarokên wê nekarîne wê bînin Amedê. Niha jî gora wê li bajarê Îzmîrê yê Tirkiyê ye.

Berhemên Eyşe Şan

Eyşe li dû xwe ev berhem hiştin: “Zerî Heyran”, “Xezal Xezal”, “Were Keçê Nav Zebeşan”, “Sallana Sallana”, “Saliho Kurmam”, “Mamo”, “Lawikê Mêtînî”, “Kirasê Te Meles e”, “Heywax Dayê”, “Hawar Bawo”, “Esmerê Were/Neyleyim”, “Delal”, “Berîvana Malxerab”, “Bawê Seyro”, “Ay Dil”, “Ax Lê Gulê”, “Koçerê (Min Te Dîbû)”, “Were Yadê”, “Cemîle”, “Memir Mamo”, “Hawer Delal”, “Qederê”, “Ax Lê Nazê”, “Wele Te Nastînim”, “Ximximê Torîvan”, “Yara Min”, “Xerîbim Dayê”, “Meyro”, “Bêmal”, “Govend Ranabê”, “Yadê Rebenê”, “Lê Lê Ximşê”, “Xezalê”, “Heseniko”, “Mamir”, “Ez Xezal im…”

# Akademiya Civaka Demokratîk; cihê xwenaskirin û zanistê ye

Di pêşxistin û rêxistina civakê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rola Akademiya Civaka Demokratîk sereke ye. Di nava salekê de 1500 kes tevlî perwerdeyên girtî yên Akademiya Civaka Demokratîk bûn, herwiha 200 kes jî tevlî perwerdeyên demkî û vekirî bûne.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Akademiya civaka demokiratîk di 6`ê miha 2013'an de hat vekirin. Kongireya yekemîn bi navê Nûrî Dêrsimî li bajarê Amûdê hat lidarxistin.Piştî konfiransa wê ya yekemîn navê wê hat guhertin û ji navnenda Nûrî Dêrsimî bû Akademiya ronakbîrî û ramanên azad. Piştre bi navê Akademiya Civaka Demokiratîk hat ragihandin û tespîtkirin. Şaxên akademiyê li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin.

Akademiya Civaka Demokiratîk ji dema damezrandina wê heya roja îro li ser bingeha civakeke exlaqî, siyasî û di bin diruşmeya ronîkirin û azadkirina civakê hatiye avakirin. Akademî bi perwerdekirin û avakirina kesayetên civakê hatiya avakirin. Li ser vê bingehê jî kar û xebatên ku akademî dide meşandin ew e ku tevahî civak, pêkhate, endam û kesayetên xwende û nexwende yên di nava civakê de di perwerdeyê re derbas bike û wan li ser remanê azad pêşbêxe. Herwiha zanebûn û perwerdekirin bingeha avakirina mirovan ne. Ji dema destpêkirina Şoreşa Rojava heta roja îro Akademiya Civaka Demokiratîk roleke pir girîng di nava civakê de lîstiye. Ev pêşketin jî bi çavan tên dîtin û di nava civakê de guhertinên ku hatine çêkirin di milê pêşxistina hizrê ku bi salan di serê civakê de hatibû rûniştin û guhertina wê pêkanîn. Hişmendî û fikirê netewperestî, olperestî, nijadperestî ewqas di nava civakê de hatiye rûniştin, bi saya Şoreşa Rojava ya ku li ser bingeha azadiyê hatiya avakirin, Akademiyên Civaka Demokiratîk dikarîbûn vê rolê bi awayekî serkeftî bilîze.



**Armanca avakirina Akademiyên Civaka Demokratîk**

Civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêxistinkirin û amadekirina gel ya Şerê Gelê Şoreşgeriy e. Ev akademî bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine vekirin. Demên perwerde gorî derfetên ku rewşa herêmê tên guhertin. Bi vekirina akademiyan de, demên perwerde gor xweseriyên cih tên plansazîkirin. Ji bo rêxistinkirina hemberî hişmendiya mêrê serdest û xwe parastina her cûreyê tûndiyê perwerdeyên xweser tên vekirin. Zimanên perwerdeyê li gor pêkhateyên herêmê jiyan dikin tê xuyakirin. Gorî hejmarên ne zelal 1500 kes di sala 2024'an de perwerdeya akademiya Civaka Demokratîk yên girtî derçûn e. Di heman demê de, 200 kes jî perwerdeyên demkî û vekirî de derbas bûn e. Kovara bi navê Akademiya Civaka Demokratîk her sal tê weşandin. Akademîyê de beşa lêkolîn û parastinê jî tê rêxistin kirin. Mijarên ku kovarê tên weşandin jî mijarên nîqaşên ku perwerdeya Civaka Demokratîk û pirsgirêkên rêxistin buyina civakê ye. Beşa lêkolînê jî, li ser jinên şoreşger û partiya netewperest ya BAAS'ê jî lekolînek stratejik hatkirin.

**Xebatên Akademiya Civaka Demokratîk a Kantona Cizîrê**

Di asta Kantona Cizîrê de Akademiya Şehîd Rûken bi 45 rojan perwerde dide şagirtan. Navenda perwerdê li bajarê Hesekê ye. Zimanê perwerdê yê resen Kurdî û Erebî ye. Li kampên koçberên Serêkaniyê (Waşokanî) jî 3 akademiyên Civaka Demokratîk xwe bi rêxistin dike. Ev akademî bi navê Şehîd Ebd Remezan, Husam Selena û Şehîd Zêrîn xwe bi rêxistin dike. Perwerdeyên ku li wan beşan tên dayin perwerdeyên vekirîn e. Di akademiyan de jî perwerdeyên birdozî tê dayin. Di bajarê Dirbêsiyê akademiya Şehîd Berçem di heman bingehê de xwe rêxistin dike û şagirtan perwerde dike. demên perwerdeyên akademiya Şehîd Berçem 30 roj in. Perwerde bi vekirî û girtî gorî derfetan tên vekirin. Li bajarê Amûdê akademiya Şehîd Sûûd hey e. li wê derê demên perwerde destpêkê 45 roj bûn, bi sedemên êrişên dewleta dagirkeriya Tirk demên perwerdê 25 rojan hatin diyarkirin. Perwerde ji bo gûndên derdorê Amûdê jî tên dayin. Ev perwerdeyên akademiya Şehîd Sûûd demkî yanî vekiriy e. li bajarê Qamişlo jî akademiya Şehîd Lokman di heman şêwazî perwerde tên dayin. Li Qamişlo jî perwerdeyên demkî tên dayin. Li vir jî du zimanan perwerde tên dîtin Kurdî û Erebî. Li Bajarê Qamişlo bi kelecanekê mezin perwerde tên dayin û di heman demê de tên rêxistin kirin. Li navçeya Tirbespiyê xebatên akademiya bi navê Şehîd Nejbîr xwe rêxistin dike, xebatên xwe di heman bingehê de dimeşîn e. Bajarê Dêrikê jî, akademiya Şehîd Xelil Dêrik heye. Li bajarê dêrikê jî perwerdeyên demkî, girtî û yên xweser jî tên dayin. Bajarên pêkhateyên Ereb tê de jiyan dikin weke Til Hemîs, bi navê akademiya Şehîd Rêzan xwe rêxistin dik e. perwerdeya bajorkê Til Hemîs zimanê Erebî tê dayin. Ev perwerde 30 rojan didom e. Bajarên weke Til Koçer, Cezaa, Hol jî di bin sîwana navende Til Hemîs perwerde li wan bajaran jî tên dayin. Li Cezaa akademiya bi navê Şehîd Mihemed Ebas, di heman demê de akademiya xweser ya ji bo jinên herêmê tê birêvebirin bi navê Rojbîn Ereb hatiye vekirin. Ev akademî pirsgrekên jin û civakê nîqaş û çareser dike.

**Xebatên akademiya Civaka Demokratîk Kantona Firat**

Li bajarê Reqa akademiya Eziz Ereb kar û xebatên perwerdeya desteyê dimeşîn e. Perwerde bajarê Reqa 2 mehan didome û girtî tên dayin. Akademiya bajarê Kobanê 2 beşan kar berdewam dike. Xebatên giştî bi navê Şehîd Herekol û yên xweser jî wek Şehîd Hêlîn xwe rêxistin dike, kar û xebatên perwerdê bi awayekî serkeftî tê meşandin. ev perwerde jî bi şêwazeke demkî, vekirî tên dayin. Li wir jî ji ber êrişên dagirkeriya Tirk perwerde bi demkî tên dayin. Bajarê Minbicê akademiya Şehîd Ismaîl Mûsa bi rêxistinkirina civakê radib e. Akademiya Xweser ya bajarê Minbicê bi navê Şehîd Zîlan ku hijmarekî baş jin daye perwerde kirin. Li wir hem demkî û hem girtî perwerde tên vekirin. Bajarê Dêrezorê perwerdeyên akademiyê bi navê Şehîd Merwan tên meşandin. Bajarê Tebqa akademiya Xalid Elewî heman kar û xebatan rêve dibe. Ev perwerde avakirinê jî tên dayin. Ev jî 1 meh perwerde dike û girtî tên meşandin. Li bajarên hatine dagirkirin weke Şehba bi navê Şehîd Polat li Helebê jî bin sîwana Meclîsa bajêr yê Helebê dihate meşandin.

**Astengîyên pêşîya Akademiyên Civaka Demokratîk**

Êrişên ku li ser herêmê tên kirin perwerdeyên akademiyê bandor dike. Ji ber ne xwendinê gelek caran lêkolîn kêm dimîne. Ji ber şerê taybet yên dewleta Tirk ya dagirker bandor li ser xebatên Akademiya Civaka Demokratîk jî dike. Akademiyê de gelek weşanxaneyên ku pirtûkên cuda nayên dîtin. Akademî ji bo rêk û pêk civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê perwerde bike xebatên xwe wê bi domîn e.

# Êriş dibin sedema bêparbûna xwendekaran ji perwerdê

**Navenda Nûçeyan**

**Cîgirê Hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Azad Berazî diyar kir ku bi sedema êrişan gelek xwendekar ji dibistanên xwe dûr ketin û dibistan hatin rûxandin û wiha got: "Me gelek pilan diyar kirine û em hemû hewildanên xwe dikin da ku xwendekar careke din li dibistanên xwe vegerin."**

ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi hezaran kes neçarî man ku koçber bibin. Ji bo bicihkirina koçberan Rêveberiya Xweser hemû derfetên xwe kir dibin xizmeta koçberan de. Lewma pêwîstî hat dîtin ku 151 dibistan ji bo koçberan werin valakirin. Li Tebqayê 60 dibistan, li Reqayê 71 û li kantona Cizîrê jî 20 dibistan ji koçberan re hatin amadekirin. Ev yek bandoreke neyînî li ser sîstema xwendinê kir, ji ber ku hejmara şagirtan zêde dibe û dibistan kêm dibin. Di derbarê bandora êrişan li ser qada perwerdeyê Cîgirê Hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Azad Berazî ji Rojnameya me re axivî.

**Bêparbûna xwendekaran ji perwerdê**

Azad Berazî da zanîn ku ji destpêka kirîza Sûriyê ve di sala 2011'an de hemû hêzên redîkal berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê çi li Serêkanî, Girê sipî, ji ber ku ev hêz hemû ji bo dagirkeriya Tirk kar dikin û dûrî berjewendiyên gelên Sûrî ne û wiha got: "Ev şer domandin li ser herêmê heya ku Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat damezrandin, şer û êriş gurttir bûn, ji ber ku Rêveberiya Xweser pirojeya demokratîk pêk tanî ev piroje bi bingeh bû û gavên istratîcîk bi riya wê hatin avêtin .Îro jî rewşa Sûriyê rewşeke hestiyar e piştî rûxandin Rêjîma Eseed li Şamê şer li her deverî gurttir bû, bi taybet ji aliyê çeteyên dagirkeriya Tirk ve. Ev rewş bi giranî bandor li ser perwerdeyê kir, di heman demê de metirsiyek xist di nava gel de ku ji pêvajoya fêrkirinê dûrbikevin. Her wiha herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka kirîza Sûriyê ve rastî êrişên giran hatin û gelek zirar giha hemwelatiyan, him talankirin, wêrankirin, kuştin û tecawizkirin jî hat kirin. Di encamê de jî zêdetirî 200 dibistanî hatin rûxandin û nêzî 400 dibistanî nîvço hatine rûxandin."

**Pilanên desteya perwerdeyê**

Cîgirê Hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Azad Berazî axaftina xwe bibawî kir û wiha got: "Desteya Perwerde û Fêrkirinê hewl dide pilankî diyar bike, ku dibistanan çaksaz û amadebikin ji bo xwendekaran, demsala xwendinê zû dest pê bike û zêdekirina seatên dibistanê. Bi hevkariya hemû desteyên perwerde û fêrkirinê piştî hemû dibistanên me ji aliyê welatiyên Efrîn û Şehbayê ve vala bibin ev pilan pêk were. Ji ber ku sedema êrîşan koçberî çêbû û em neçar man wan di dibistanan de



bicih bikin. Ev yek bandor li demsala xwendinê kir. Daxwaza me ji hemû saziyên navdewletî re ew e ku bi erkê xwe rabin û ev alozî û êriş li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestin, ji ber ku bandoreke mezin li derdorê dike bi taybet li ser xwendekaran û bi sedan zarok ji xwandinê bê par dimînin. Herwiha bingeha perwerde û fêrkirinê dirûxîne, pêwîste hemû saziyên erikdar zarokên me biparêzin û rewşeke aram ji bo fêrkirinê peyda bikin."



# 'Em nebin yêk em ê herin yek bi yek'

Endamên Desteya Amadekar yên PYNK'ê Aldar Xelîl û Perwîn Yusif dan diyarkirin ku PYNK'ê ji bona yekrêzî û welatperweriya gelê Kurd dê xebatên xwe bidomîne û gotin: "Yêkitiya gelê Kurd, yêkbûyîna tevahiya Sûriyê ye."

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Hevdîtinên di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS) û Partiyên Yekitiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) de, herî dawî ji ber nelihevkirina li ser xalên mîna perwerdeya kurdî û hevserokatiyê xitimîbûn. Bi destpêkirina hilbijartinên Amerîkayê şandeya amerîkî ya navbeynkara diyalogên di navbera her du aliyan de, vegeriyabû Amerîkayê û ev yek jî wek sedemeke sekinandina diyalogê hatibû nîşandan. Piştî hatina nûnerên Amerîkayê yên nû diyolagê bi tu awayî dest pê nekiribû.

Di 28'ê adara 2021'ê de Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdî bang li ENKS û PYNK'ê kir ku li diyalogan vegerin. Piştî banga Ebdî PYNK-ENKS ragihandin ku banga Mazlûm Ebdî bi awayekî erênî dîtine û dê dest bi hevdîtinan bikin. Li piştî banga yekitiyê ENKS dîsa li ser helwesta xwe ya dijî yekitiyê dubare kiribû. 22'ê Berfanbar a 2024'an li bajarê Qamişlo Hola parka Azadî komcivînek di bin rêveberina PYNK'ê destpêkir. Derbarê komxebatên PYNK'ê yên yêkrêzîyê Endamên Desteya Amadekar yên PYNK'ê bi navê PYD'ê Hevserokên PYD'ê Aldar Xelîl û Perwîn Yûsif ji rojnameya me re axivîn.

**'Yêkitî nebe em nikarin Sûriyê ji nû ve dizayn bikin'**

Endamê Desteya Hevserokatiya Revebir a PYD'ê Aldar Xelil bibîrxist ku rêya avakirina Sûriyekê demokratîk û pir netew li yêkitiya gelê Kurd re derbas dibe û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Destpêkirina şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, em hertim li wê pirsê dikin. Gelo Sûriyê de çareseriyek ava bû dê mafê gelê Kurd çawa bê parastin? Dê Sûriyê dîsa di bin pergala netew dewlet bê revebirin an jî dê dewletek navendî be? Ev pirs bersivên xwe digerin. Dê Sûriyeke nûve hatiye avakirin Kurd çawa jîyan bikin? Pergala me ya Rêvebiriya Xweser pergalekî diyare û zagonên wê hatiye xuyakirin. Netewa Demokratîk û azadiya jinê xetên me yê sorin. Pêwiste ji ber wê ji bona Sûriyekê ku di aliyê gelê Kurd ve bi rêvebirin, rêxistin û tevgerên Kurd bibin yêk. Zagona ku Sûriyeke demokratîk de, bê mîsogerkirin ku Kurd hêzeke bingehîn ya Sûriyê tevahî ne. Ji ber wê ye hertim wek PYD û saziyên Rêveberiya Xweser hertim hewildanên me yên yêkkirin û yekxwaziya gelê Kurd çêbû. Destpêkirina şoreşê û heya roja me ya îro jî ev hewildan û xebatên me hene û dê berdewam jî bike. Lê piştî hilweşandina Rejîma Bees'ê hîn tişt êdî teqez bê kirin. Yêk jî wan xebatan jî yekitîya gelê Kurd e. Armanca ev komxebata ku hatdarxistin jî ev bû.

**'ENKS'ê wek hertim bangawaziya me bêbersiv hişt'**

Aldar Xelil helwesta tevlînebûyina ENKS'ê ya komxebata ji bona yêkrêziya Kurdî rexne kir û axaftina xwe wisa qedand: "Fermandariya Giştî ya QSD'ê Mazlum Ebdî bangawazî kir ku ji bona partî û tevgerên Kurdî kir ku ji bona xebatên yêkrêziya kurdan bi xurttir kar û xebat bikin. Ev bangawazîye di aliyê me wek PYD û partiyên din yê yekitiya Kurd erenî hat dîtin. Lê ser wê bangê PYNK'ê hat avakirin û ev konferans hat



**Aldar Xelîl**

pêşxistin. Lê ENKS'ê tevlînebû û helwesta xwe ya dijî yekitiyê dana holê. Wek seydayê Cîgerxwûn da diyarkirin "Em nebin yêk, emê herin yêk bi yêk" Ji ber wê yekê disa em bangê ENKS û partiyên di heman helwestê de dikin, tevlî komxebatên yêkitiyê û yêkrêzîyê bibin."

**'Rola jina kurd dê pêşeroja Sûriyê bide xuyakirin'**

Hevseroka PYD Perwîn Yûsif da diyakirin ku rista jina kurd li xebatên yêkitiyê de giringe û wiha axifî: "Em wek partî û saziyên siyasî yên bi navê PYNK komxebata jî, ji bona yêkitiya gelê Kurd kombûn e. Pewiste hem wek şandeya PYNK, hem jî gelê Kurd yê



**Perwîn Yûsif**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dike em piştgrî bidin komxebatên wê şêwazî. Em wek PYD ji heya dawiyê çi erk dikeve li ser milê me wek rexistin em amade ne. Di wek hemû qadên şoreşê de, di aliyê yekitî û yekrêziya gelê Kurd jî ristek mezin dikeve li ser milê jina Kurd. Ji ber ku jinên tevahî Sûriyê di bin desthilatiya Rejîma Bees'ê de zext û qirkirin jiyan kirin. Di heman demê de komên HTŞ'ê û çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker hişmendiyên wan tên zanîn. Ev bi ti şêwazî hêza jinê napejirînin. Ji ber wê yekê pêwiste jinên herêmê xebatên yekitiyê tevlî bibin û Sûriyeke nû bi hêza jina Kurd mohre xwe hebe. Bangawaziya min ji bona hemû jinan û ciwane tevlî xebatên yêkrêzîyê bibin."

# Dagirkerî ji bo rastiya xwe veşêre rojnamevanan dike armanc

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Rojnamevan Ebdulhelîm Silêman û Zana Omer diyar kirin ku Rojnamevan ew ê ku xwedî erkekî exlaqî ye ku deng û şopînerê rastîyê ye, lewra çi alîyekî ku rojnamevanan armanc bike, sûcekî şer dike û Tirkiyê vî sûcî dike, da ku rastî û têkçûyîna xwe veşêr e.**


Dewleta Tirk a dagirker bi 10'ê salan e li dijî berxwedan û vîna gelê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişên xwe didomîne. Ji ber ku Çapemeniya Azad ji destpêka avabûna xwe ve û heya niha rastiya dagirkeriya Tirk ji cîhanê re radighîne, ew her dem dibe hedefa dagirkeriya Tirk, herî dawiyê dema ku nûçegihana Ajansa ANHA'yê Cîhan Bîlgîn û rojnamevan Nazim Daştan dema ku li eniya şer, li pira Qereqozaqê-Sirînê nûçe dişopandin, ji aliyê balafirên bêmirov ên dewleta Tirk a faşîst ve bi êrişeke hewayî hatin şehîdxistin, armanca wan ew bû ku rastiya êrişên dagirkeriya Tirk ji cîhanê re ragihînin. Tevî hemû êrişan û dayîna berdêlên giran jî, çapemeniya azad di rêwîtiya heqîqetê de bê navber meşa xwe dewam dike. Rojnamevan ji bo derxistina rastiyê, tu sînoran nas nake, tenê bi çavên xwe rastiyê dibîne û wê rastiyê bi kamîreya xwe derdixe holê.

Derbarê hedefgirtina rojnamevan ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, rojnamevan Ebdulhelîm Silêman û Zana Omer Ji Rojnameya me re axivîn.

Rojnamevan û nûçegihanê Indibindin Erebiye li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdulhelîm Silêman diyar kir ku piştî ketina Eseed dewleta Tirk a dagirker giraniya xwe bêtir daye ser herêmê û wiha got: "Piştî guhertinên ku li Sûriyê pêk hatin, bi taybet bi ketina rejîma Baas dewleta Tirk bêtir giraniya xwe daye ser kurdan, Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevahî di tabloya Sûriyê de dixwaze lewaz û qelis bike. Dewleta Tirk a dagirker karekî gelekî berfireh li dijî kurdan dide meşandin, nexasim di warê ragihadinê de, li tenşta karê leşkerî ku piştgiriya çeteyên girêdayî xwe yên ku bi artêşa niştîmanê tê naskirin, dike. Herwiha ev êrişên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve tên kirin, mixabin di roja pênşema bûrî de bû sedem ku hevalên me yên rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazin Daştan bên armanckirin û şehîd bibin, ew jî di wê çarçova êrişa ya rojnamevanî û medyayê bi ser vê deverê ve ye."

**Dagirkerî ji bo rastî û têkçûyîna xwe veşêre rojnamevanan dike armanc**

Rojnamevan Ebdulhelîm Silêman da zanîn ku Tirkiyê naxwaze ew dîmenên têkçûyîna çeteyên girêdayî wê bighêje raya giştî û wiha got: "Hebûna rojnamevanan, gihandina wêne û dîmenên ku çawa çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker tê şikenandin li çeperên ên ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê berevaniyê tê de dike, Tirkiyê naxwaze ew dîmenên



**Ebdulhelîm Silêman**

têkçûyîna çeteyên girêdayî wê bighêje raya giştî, hevkarên me Cîhan Bîlgîn û rojnamevan Nazim Daştan hatin armacgirtin bi vê mebestê ku dengê rastiyê dernekeve. Di warekî din de jî dewleta Tirk û çeteyên wê di van rojan de alavên ragihandinê bi taybet medya civakî de bi awayekî zanyariyên şaş belav dikirin û derewan li gel dikirin, da ku wan bixapînin û berê wan bidin şerekî ku gel ewlehiya di nav xwe de têk bibe, ew bûn sedem ku gelek ji gelê herêmê şaş bibin û li gorî zanyariyên derewîn werin xapandin, lê ya girîng bi derxistina rastiyê ya ku ji aliyê rojnamevanan derket pêş, gel ji wê xapandinê hişyar bû."

**'Tirkê dixwaze ewlehiya civakê têk bibe'**

Rojnamevan Ebdulhelîm Silêman da eşkerekirin ku dewleta Tirk bi riya şerê taybet dixwaze ewlehiya civakê têk bibe û wiha got: "Dewleta Tirk di çarçoveya şerê taybet de dixwazin ewlehiya civakî têk biçe, li ser vê yekê gelek kar dikin. Herwiha bi hezaran



**Zana Omer**

zanyarî û dîmenên şaş ê ku dem li ser derbas bibûn ji nû ve belav kirin, ev hemû li dijî rastiya ku heyî bûn, tecrûba Minbicê li pêş çava ne dema ku gel xapandin û hiştin ku şer li wir rû bide, niha dema ku gelê Minbicê van kiryarên çeteyên dewleta Tirk dibêjin, çete devên wan digirin. Di heman çarçoveyê de, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê vî şerî li dijî deverê didin meşandin."

**'Wê armanca dewleta Tirk û çeteyên wê pêk neyê'**

Rojnamevan Ebdulhelîm Silêman axaftina xwe wiha qedand: "Ez di wê baweriyê de me ku wê ne armanca dewleta Tirk û ne jî ya çeteyên wê pêk were, ji ber raya giştî û navdewletî deverê nas dikin û dizanin dewleta Tirk û çeteyên wê çi sûcan di derheqê Sûriyê giştî, bi taybet gelê kurd de, pêk tînin."

**'Pêwîste rojnamevan kiryarên dijî rojnamevanan têne kirin eşkere bikin'**

Rojnamevan û çêkerê belgefilman Zana Omer da zanîn ku rojnamevan erkdarê eşkerekirina rastiyê ye û wiha got: "Rojnamevan yê herî erkedare ku rastiyê ji bo raya giştî eşkere bike, çi alîyekî ku rojnamevanan armanc bike, sûcekî şer dike, ev tawanek giran e, pêwîste helwestek rişd li hemberî vê tawanê hebe, ew jî li gorî van astan were xwestin, asta yekê pêwîste rojnamevan bêdeng nemînin û kirîyarên dijmin ên dijî rojnamevan eşkere bikin, ya din jî pêwîste rojnamevan bi alîkarîya rêxistinên mafê mirovan ku her sûcekê li hemberî rojnamevanan belge bikin û sûcdaran destnîşan bikin. Herwiha hemû doz li pêş dadgehên navnetweyî û herêmî dijî êrîşkar û sûcdaran veke. Ji xwe Tirkîyê ya herî ku sûcdare û dixwaze rastîya heyî veşêre, pêwîste hemû rêxistinên navnetweyî Tirkîyê wek sûcdar nas bike û binav bike."

**'Pêwîste Rojnamevan dengê gel û rastîyê be'**

Rojnamevan Zana Omer axaftina xwe wiha qedand: "Rojnamevan ew ê ku xwedî erkekî exlaqî ye ku deng û şopînerê rastîyê be, ji bilî wê heger çi rojnamevanek dûrî pîvana ratiyê bikeve wê sûcdar be, pêwîste çi agahîyek ne rast bê belavkirin pêwîste Rojnamevan bi xwedî helwestek aktîf be, nexasim di demên hestîyar û êrîşan de. Kurd li Rojava rastî gefeke mezin ya qirkirinê tên, pêwîste Rojnamevan dengê gelê xwe û dengê rastîyê be."

# KNK: Pêwîste partiyên kurdî bê nakokî tevlî konferansa netewî bibin

Endamê KNK'ê, Ebdilîlah Erebo diyar kir ku armanca Konferansa Kurd ew e ku nêrîneke yekgirtî ji bo yekrêziya kurdî ji hemû aliyên kurdan kom bike, lewma jî divê partiyên siyasî bê nakokî tevlî bibin. Sekreterê Partiya Çep a Kurd Sûrî, Mihemedê Mûsê jî da zanîn ku yekrêziya kurdî erkê KNK'ê ye û divê partiyên kurdî nakokiyên xwe bidin hêlekê.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Li darxistina Konferansa Kurd yek ji biryarên herî girîng bû ku Kongreya Netewî ya Kurdistanê(KNK) di 21'ê vê mehê de, da. Di daxuyaniya KNK'ê de hat zanîn ku ew amadekariya xwe dikin ji bo lidarxisitina konferanseke netewî- kurdî.

Di derbarê girîngiya lidarxistina vê konferansê de, endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Kurd, Ebdilîlah Erebo û sekretêrê giştî yê Partiya Çep a Kurd li Sûrî, Mihemedê Mûsê ji rojnameya me re axivîn.



Ebdilîlah Erebo



Mihemedê Mûsê

**'Konferans ji bo kombûna nêrînên hemû aliyên kurdî ye'**

Erebo da zanîn ku armanca konferansê ew e ku nêrîneke yekgirtî ji bo yekrêziya kurdî ji hemû aliyên kurdan kom bike û wiha got: "Ji ber ku pêşketinên bilez ên Sûriyê pêk tên û guhertin çêdibin rasterast bandor li ser kurdên Rojava tê kirin. Nexasim piştî ruxandina rêjîma Baas. Niha jî pêwîste gelê kurd hewldanên xwe yekalî bikin. Ji ber vê yekê em dest bi amadekariyên lidarxistina konferanseke kurdî bi beşdariya hemû partiyên kurdî, kesayetên serbixwe, jin, ciwan û hemû qadên civakê dikin. Di encamê de komîteyeke amadekar hat avakirin, endamên vê komîteyê ji nûnerên partiyên cuda pêk tên. Armanca vê konferansê ew e ku nêrîna hemû aliyên kurdî ji bo doz û yekrêziya kurdî li hev kom bike. Li ser vê bingehê nêrîneke yekgirtî ku di vê qonaxa girîng de, li pêş bixe û hêviyên gelê kurd pêk bîne."

**'Bi yekîtiyê em bihêztir dibin'**

Endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Kurd, Ebdilîlah Erebo tekez kir ku bi yekrêziyê, wê kurd bihêztir bibin û wiha domand: "Berî niha dewleta Tirk gelek netew qir kirine, niha jî dixwaze ku gelê kurd qir bike. Herwiha bi siyaseta xwe hewl dide ku Mîsaqa Millî pêk bîne. Lewma tişta girîng ew e ku partiyên kurdî li hev bicivin û lêvegerekê ji bo doza gelê kurd ava bikin. Di vê dema girîng de jî pêdivî heye ku partiyên kurdî bi hev re xebatê ji bo yekbûna gelê kurd û parastina mafê kurdan bikin. Bi yekîtiya partiyên kurdî, civata Kurdî bihêztir dibe û dikarin li Rojava mafê xwe bi dest bixin. Hêvî û banga me ji bo hemû tevger, rewşenbîr, partiyên siyasî û kesên serbixwe ew e ku bila nakokiyên siyasî bidin milekî û bi hev re li Konferansa Kurd ji bo berjewendiyên gelê kurd hevrêziyekê ava bikin."

**'Erkê KNK'ê pêkanîna yekrêziya kurdî ye'**

Mihemedê Mûsê anî ser ziman ku konferansa KNK'ê xebatekê ji bo yekrêzî û yeknêrîna gelê kurd dike û wiha axivî: "Beriya salekê Kongreya Netewî ya Kurdistanê biryar da ku li her parçeyekî Kurdistanê konferansekî li dar bixe. Di wê demê de jî KNK'ê beşa Rojava biryar da ku di bin sîwana konferansekî giştî de, konferansa xwe li Rojava li dar bixe. Piştî guhertina rewşa Sûriyê û geşedanên ku bi lez çêbûn, bi taybet rûxandina rêjîma Baas û serkeftina Nusra bi tevkariya Tirkiye û Qeter, KNK'ê bangewazî kir. Helbet bandora van guhertinan li tevahiya Kurdistanê heye. Em dibînin ku ev hewldaneke ji KNK'ê ye ji bo diyarkirin û zelalkirina helwesta wê ji bo pêkanîna yekrêziya kurdî. Armanca KNK'ê ew e ku civateke berfireh çêbibe, tê de jî rewşa gelê kurd û doza kurdî piştî van guhertinên bingehîn were nirxandin û lêkolînkirin."

**'Divê partiyên kurdî nakokiyan bidin alî'**

Sekreterê giştî yê Partiya Çep a Kurd li Sûrî, Mihemedê Mûsê destnîşan kir ku divê paritiyên siyasî nakokiyên di navbera xwe de bidin hêlekê û wisa bi lêv kir: "Hevrêziya kurdî, pirseke û her kurdek vê pirsê ji xwe dike. Raste her partiyek xwedî îdiyolojiyeke û tiştekî asayî ye û bingehê pirrengiyê ye. Lê di dema heyî de ne dema nakokiyên siyasî yên di navbera partiyan de ye. Lewma jî pêwîste partiyên kurd li Rojava nakokiyên xwe bidin hêlekê, ji bo ku mafê xwe weke pêkhateyên din li Sûriyê bi dest bixin."

## Ji 2024'an ber bi 2025'an ve



**Ahmet Aktaş**

Li cîhanê û bi taybetî li Rojhilata Navîn, sala 2024an, ji hemû salên berê pirtir tije alozî, pevçûn, şer û ceng bû.
Hir wiha tê xuya kirin ku ev şerd û mercên giran bi heman dijwariye xwe wê derbasî sala 2025'an bibe.
Îca ka em bala xwe bidin sala derbasbûyî, gelo kî serkeftî bûn, kî ne serkeftî bûn?
Weke tê zanîn du şerê mezin û balkêş; şerê Ukraynayê û Xezayê, di sala 2024'an de birêve çû û ev her du şer bê encam derbasî sala 2025an dibe.
Lê li ser van her du şeran, her du dewletên giregirên cîhanê Rûsya û DYE, di encama gelek bazarên hûr û kûr de lihevhatinek demkî pêkanîn û bi vêya re rewşa şerê cîhanê yê 3yan hinek hat guherandin.
Qasî tê dîtin DYEyê li Ukraynayê hinek herêm bi destê Rûsyayê ve berda, Rûsyayê jî Sûriye bi destê DYEyê ve berda.
Li goreyî vê encamê, zerar û ziyana Rûsyayê û hevalbendê wê Îranê zêdetir bû, ev jî tê wateya ku Rûsya û hevalbendên xwe ne serkeftî bûn di sala derbasbûyî de.
Her wiha bandora wê û ya Îranê, ya li herêma Rojhilata Navîn şikestinek mezin xwar.
Jixwe Sûriye bi tevayî ji destên wan derket û bi giranî ket destê DYEyê û hevalbendên wê Israilê û hwd, ev jî tê wateya ku DYEyê û hevalbendên xwe hinek serkeftî bûn.
Hilbet li ser van her du bûyerên mezin û bi taybetî li ser hilweşendina pergala Beşar Esad, bêdeng mayîna Çînê gelek balê dikişîne û cihê meraqê ye. Jiber ku di cenga cîhanî ya 3yan de, tê zanîn ku armanca bingehîn a DYEyê û hevalbendên wê rûxandina bandor û pêşkeftina Çînê ya li cîhanê ye. Lewma bendewariya hilwesta Çînê heye.
Bê gûman li vira ya gelê me yekser têkildar e; rewşa doza azadiya gelê me ya giştî ye û bi taybetî jî rewşa Şoreşa gelê me ya Rojava ye.
Heta nuha, li gel ewqas tevlihevî, şer û pevçûnên mezin û berfireh çêdibin, nikare were gotin ku Tevgêra Gelê me serkeftî ye an jî şikestin xwari ye.
Mirov dikare bêje; şer û pevçûnên leşkerî û hewldanên bazarên siyasî û dîplomatik, bi hemû germayî û dijwariya xwe, bi piralî dewam dike.
Sedemên Tevgêra Azadiya Gelê Kurdistanê şikeste nexwariye û şensa wê ya karibe destkefiyên xwe bi parêze û her wiha di dema pêş de, wê karibe bibe xwedî destkeftiyên zêdetir û watedardir, jiber ku xwedî Rêberî, bîrdozî, bername, plan-proje û ya herî giringtir jî xwedî rêxistinek bi serpêhatî-tecrûbeyê dem dirêje!
Wisa diyar dibe ku sermayeya yekdestiya cîhanê, êdî dixwaze di vê pêvajoya Cenga Cihanî ya 3yan de, bi navê Dizaynkirina Nuh A Cîhanê, li Rojhilata Navîn wê dawiyê li statukopareziya netew-dewletiyê bîne.
Di encamê vê pêvajoyê de, gûman xurt heye ku sala 2025an wê bibe sala binkeftina pergala Netew Dewletê û şwîna wê bibe sala serkeftina Netewa Demokratik.
Her wiha, piştî Sûriyê û Libnanê, dibe ku li gel
Qibrisê dor tê Îranê û Tirkiyeyê, serkeftin jî dibe para Şoreşa Kurdistanê!

# 'Yekrêziya kurdî ji vê qonaxa hestiyar re girîng e'

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Nivîskar û lêkolîner Ebdela Şikakî diyar kir ku ji sedsalî û şûn de hebûna kurdan hatiye fetsandin, lê îro roj Bakur û Rojhilatê Sûriyê di rewşeke hestiyar re derbas dibe û ji bo ev rewş were çareserkirin yekrêziya kurdî girînge.**



Derbarê qonaxa heyî ya ku Sûriyê tê re derbas dibe û girîngiya yekrêziya kurdî, nivîskar û lêkolîner Ebdela Şikakî bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Piştî ketina rejîma Baas rewşa Sûriyê wê ber bi ku ve biçe?**

Niha rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê di demeke pir hestiyar re derbas dibe, têde hebûn û tinebûn heye. Eger gelê me di vê qonaxa heyî de xwedî li şoreşa xwe dernekeve, muhtemele keda ewqas sal têk biçe. Ewqas sal kar û xebat tê kirin bi taybetî ji 40 salî û vir de, mijara mafê gelê kurd hatibû binpêkirin, tam zelal nehatibû naskirin ku maf çi ye, pir piropoganda dihatin çêkirin, bi taybet endamên partiyan ku ev partî welatparêze ev partî ne welatparêze, hin kes doza netewî dike an nakin, propogandayên wiha pir derdiketin, lê mijar ne tenê mijara netewî ye, jê kurtire.

**Ji bo ku Yekrêziya Kurdî pêk were çi pêwîste were kirin?**

Berî em behsa netewa kurd bikin ku di Rojhilata Navîn de bê par maye, di cewher de xebata gelê kurd ji bo hebûna xwe li ser vê qadê isbat bike, ev tiştekî pir girînge. Sîstemên desthilatdar ku Kurdistan di nav hev de parve kirine, ji sed salî û vir de hebûna gelê kurd inkar dikirin, Tirkiyê sereke Îran jî wiha ye, sîstema Baas a ku li Sûriyê û Iraqê û desthilatdar beşek ji Kurdistanê xistiye bin sîstema xwe ev hemû tewambarin di vê yekê de. Beriya sedsalî nav û dengê kurdan li Rojhilata Navîn û cîhanê belavbûyî bû, çi bûyerên di Rojhilata Navîn de bihata qewmandin, deng, tevger û hebûna kurdan tê de hebû, lê ji sed salî û şûn de hebûna kurdan hatiye fetsandin.

**Yekrêziya Kurdî çima heya roja îro pêk nehatiye?**

Piştî şerê cîhanê yê yekem, ew hevpeymanên ku derketine mîna Sayikis Pîko û Lozan hatî derketin bi komployeke mezin Kurdistan bû 4 perçe, dewletên mezin ên desthilatdarin li qezencê xwe digeriyan, lê em jî wê demê bi erkê xwe ranebûn û parastina welatê xwe me nekir. Rêxistinên me jî wê demê nebûn, rêxistin rêxistinê eşîran bû, serokê eşîrê jî ku berjewendiyên xwe tesbît kir, li gelê xwe nedipirsî. Yekrêzî lazime di wir de bihata çêkirin, ew yekrêzî nehat çêkirin, wê demê me welatê xwe winda kir û bû 4 perçe. Dema Kurdistan bû çar perçe, yekîtiya netewî zehmet bû, sînor hatin dayîn, ev dewleta ku li Sûriyê hatî çêkirin, destpêkê bin destê Ferensa gotî vir Sûriyê ye, navê Kurdistanê nema, herwiha komara Tirkiyê hat avakirin, wan jî got ev der Tirkiyê ye, kurd li ba me tuneye, li Iraq û Îranî jî wa bû, yekîtiya netewî parçe bû.

**Gelo hikumeta Sûriyê ya nû dikare bibe çareserî ji Sûriyê re?**

Hêza xurt li çem Heyet Tehrîr ElŞam tuneye ku di heftiyekê de piraniya Sûriyê bixe bin dest xwe, lê mudaxeleyek navdewletî hatiye kirin. Li Sûriyê komên çete sedî sed sîxorên dewleta Tirkin ê ku tevlihevî Sûriyê çê kiriye, ne Tirkiyê ye, Tirkî dixwaze beşek ji axa Sûriyê ji xwe re bibe. Heyet Tehrîr ElŞam niha gotinên xweş dike, lê pêşeroj wê çawa be ne diyare, ji ber ew jî berê beşek ji Al-Qaîdê bûn. Hêviya di Sûriyeke nû de QSD'ê ye. Ji xwe çareserî wê ji me dest pê bike û divê gotina me li hember cîhanê giştî yek be û biryara me dîrokî be, herwiha divê kurd di destûrê Sûriyê de beşekî sereke bin.

**Avakirina yekrêziya Kurd wê bandoreke çawa li Rojhilata Navîn bike?**

Niha kurd di pratîkê de hebûna xwe daye isbatkirin, dilê dinyayê bixwaze nexwaze, rêxistineke siyasî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye çêkirin. Dewletên mezin ji yekrêziya kurd ditirsin, ji ber dibêjin heger pirsgirêka kurd çareser bibe, pirsgirêk ji Rojhilata Navîn re namîne, wê demê kes nikare destê xwe bixe Rojhilata Navîn. Niha rewşa li Sûriyê beşekî ji rewşa Rojhilata Navîn tevahî ye, ew jî pirsgirêka kurd e, pirsgirêk kurd çareser nebe, wê aramî ne li Sûrî û ne li Rojhilata Navîn pêk bê.





# Mîrateya Apê Mûsa; Şehîdên pênûsa azadiyê


Her şehadetek ku tê jiyan kirin mirov pê diêşe. Lê hin kesayet hene ji bona dest ji doza azadiyê bernedin canê xwe feda kirin, rê nedan tu kesî dengê wan qut bike û pênûsa wan bişkine. Wan her dem dengê rastiyê ragihandin û heqîqet nivîsandin.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**







**Cengîz Altun**

Yekemîn şehîdê Kevneşopiya Çapemeniya Azad Cengîz Altûn 9'ê Tîrmehê1968'an de li bajaroka Hîsarê ya navçeya Gercûş a Êlihê dayik bû. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Êlihê qedand. Cengîz di sala 1990'î de ji Beşa Makîneya dibistana navîn ya Pîşeyî derçû. Cengîz di malbateke welatparêz de mezin bû xwe di nava Tevgera Azadiya Kurd de jî cih girt naskirina wî ya Tevgera Azadiyê ne zehmet bû. Cengîz di sala 1991'ê de, di salên xwe yên xwendekariyê de dest bi rojnamegeriyê kir. Di Rojnameya Yenî Ulke (Welatê Nû) ya hefteyî de dest pê kir. Rojnamegeriya Kurdî ku bi Halk Gerçegî (Rastiya Gel) destpê kir û bi Welatê Nû berdewam kir. Di wan rojan de, ji ber ku konsepta şer di meriyetê de bû. Çapemenî bi temamî hat bêdengkirin. Êrîşên kontra yên ku di destpêka salên 1990'î de li herêmê pêş ketin.Di demekî wiha de Cengîz ji Êlihê derket, ji wan kesên ku hewl didin dengê nerazîbûna giştî ya pêşkeftî bigihînin cîhanê. Lê piştî 3 mehan bi hevkariya JITEM û hêzên tarî Cengîz li Tirkiyeyê hat qetilkirin. Bû yekemîn şehîdê çapemeniya azad. Di sihara 24'ê Sibata 1992'an demijmêr 08:15'an de, ber navenda rojnameyê ya Êlihê hate qetilkirin. Bi tevlîbûnek girseyî merasima Cengîz Altun hat çêkirin. Nêzî salek piştî şahadeta Cengîz Altun, li ser rêya navbera bajarê Amed û Mêrdînê çerxerêya Odabagê de bi erbeyekê de di encama lêpirsînê de, çeka ku kujerê Cengîz Altun bikaranîye hat dîtîn. Lê wek her rojnamevanên hatine qetilkirin kujerên Cengîz Altun jî hîn ne dîyar e.

**Hafiz Akdemir**

Hafız Akdemir di sala 1965'an de li navçeya Licê a Amedê dayik dibe. Dayika wî debara malê dikir. Bavê wî jî karê bazirganiyê dikir. Hafizê ku bavê xwe winda kir, di sala 1984'an de dibistana amadeyî dixwend. Bi tometa rêxistina bi navê Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (KUK) hat dîlgirtin. Li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê di nava berxwedana zîndanan de cih girt û piştre mişextî Eskîşehîr û Aydinê kirin. Dema ku ji ber ku 52 rojan di girtîgehê de di greva birçîbûnê de bû hat berdan. Paşê di rojnameya Yeni Ülke de dest bi karê nûçegihaniyê kir. Li şûna ku di yek warî de pispor bibe, ew ê diçû her nûçeyek. Li avahiyên Partiya Karker (HEP) a Tekelê grevên birçîbûnê
nûçeyên berxwedana karkeran, kesên rastî îşkenceyê hatine yan jî gundên wan hatine şewitandin kir. Ji ber bandora ku wî carekê nivîsandiye navê wî kiriye "Rojin Pale". Hafiz Akdemir jî, 8 Pûşber a 1992'an de, li Amedê bi aliyê qaşo kujerên ne diyar ve hate qetilkirin. Ji bo nûçeyên xwe yên li ser Hizbullah û kontra Hafiz li hertim dikir rojev. Li ser deriyê navenda rojnameyê, tabelayek li ser Kujerên girêdayî Hizbullah nivîs nîvisandibûn, 'Pênûsa te dê bişkê, dora te ye'.

**Çetin Abayay**

Di sala 1969'an de li Êlihê ji dayik bû. Malbatekî ku xwedîyê 4 zarokan da mezin bû. Malbat ji ber nezî Tevgera Azadiyê bû herdem bin gefên tûnekirin û qetilkirinê ve rûbirû diman. Di dema Darbeya Leşkerî ya 12'ê Îlonê de Bavê Çetîn Mehmet Abayay demekê dirêj girtîgehê da ma ji ber zexta giran ya binçavkirinê de li ser hate meşandin jîyana xwe ji dest da. Çetîn, di temenî 16 saliya xwe de di sala duyemîn a dibistana navîn de hat girtin. Ew şandin Girtîgeha Amedê û 5 mehan li wir ma. Tevlî tekoşîna berxwedana Zindana Amedê jî bû. Çetîn Abayay dema ji girtîgehê derket lîse qedand. Ji dest doza azadiyê berneda. Ji ber tometa endamê Tevgera Azadiyê hate girtin û du salan di girtîgehê de ma. Wê demê xwe nebes dît û ji bona xwe pêwajoyê re bike yêk dest bi karê rojnamegeriyê kir. Di aliyê pişeyî de ezmûna xwe ya yêkemîn rojnameya Ozgur Halk (Gelê Azad) de destpêkir. Li hemberî hemû zext û gefxwarinan Çetîn tekoşîn kir û gav paşda ne avêt. Di 29'ê Tîrmeha 1992'an de dema bi hevalekî xwe dema li ser erkê xwe di wergeriya di aliyê du kujerên temenê wan di navbera 24 û 25 salî dehatin sekvankirin. Di 30'ê Tîrmeha 1992'an saet 10.00'an de nexweşxaneyan Amedê şehîd bû. Bi tevlîbûyinek girseyî li Êlihê hat spartin.

**Mûsa Anter (Apê Mûsa)**

Mûsa Anter ku em jê re dibêjin Apê Mûsa, di sala 1920'an de li Zivingê (Bajarê Kevin) ya bajarokê Stilîlê (Akarsu) ya Nisêbînê li gundê Şikeftê hatiye dinê dayik dibe. Ji bona xwendina dibistana seretayî pêşî çû Gercûşê û piştre çû Nisêbînê. Di vê navberê de 25 kesên ji Kurdên Stenbolê hatin cem hev û wan bi avakirin Komaleya Xwendekaran a Dîcleyê bi rêxistin kirin. Ev rêxistinkirina wê komeleyê armanca ku tevgerkirina xwendekaran bû, bi awayekî nîvfermî kar dikir. Di sala 1948'de rojnameya jêdera Dîcle wek rojnameyeke hefteyî dihat çapkirin. Partiya Şoreşger a ku ji aliyê Kurdên ji Partiya Karkerên Tirkiyê ve hatibû damezrandin, ji Partiya Karkerên Tirkiyê veqetiya. Piştgiriya Navendên Çanda Rojhilat (DDKO) kir. Doz di derbarê Apê Musa bi tometa endamtiya DDKO hate vekirin. Nêzî 2 sal û nîv ma dîlhat girtin. Sala 1974'an de bi efuya giştî serbest har berdan. Di vê navberê de di 22'ê Nîsana 1990'î de rojnameya Rastiya Gel (Halk Gerçegî) hat weşandin. Apê Musa di heman salê de, wê biçe Bekaayê û têkildarî pirsgirêka Kurd bi Rêberê gelê Kurd Rêber Apo re hevdîtinê bike. Rojnamaye ya Yeni Ülke di Cotmeha 1990'de dest bi weşana xwe kir û ji bona dengê rastiyê bigihine raya giştî. Bi pirsgirêka Kurd re Apê Musa bi nêz ve mijûl dibe. Kovara Rojhilatî ya ku wî bi Kemal Sülker re di sala 1951'an de derxistibû, tenê bû, ji ber bêderfetî du jimar werin çapkirin. Dema ku jê hat xwestin ku otel Palas birêve bibe, wî di sala 1953 de otêl ji bo geştiyarên biyanî vekir. Otel kire cihê xwendin û lêkolînê. Odeya îdarî ya rojnameya Yeni Ülke, ligel Musa Anter hema bêje hemû kesayetên kurd mazûvanî kir û axivî. Bi damezirandina Rojnameyên weke Zimanê Kurdî, AzadiyaWelat û Çanda Mezopotamya de cih girt. Musa Anter di nav damezrînerên Partiya Kedê ya Gel de bû. Di 20'ê Îlona 1992'an de li Amedê di xefikekê bi aliyên kujerên dewleta Tirk yên dagirker we şêwazekî hovane hate qetilkirin.

**Gurbetelli Ersoz**

Gurbetelli Ersöz di sala 1965an de li navçeya Palu ya Elezîzê ji dayik dibe. Piştî Gurbetelliyê ku ji ciwanên ji gundê Ziverê, li Gurbetellî Ersoz bandor bûn tevlî Tevgera Azadiyê bûn. Piştî qedandina Fakulteya Kîmyayê ya Zanîngeha Çukurovayê bi şêwazekî çalak tevlî Tevgera Azadiyê bû û çu warên azad. Li Zanîngeha Çukurovayê yekemîn rêxistina Xwendekarên Welatparêz li dar xist. Di zanîngeha Çukurova ya bajarê Tirkiyê Edenê, bingeha şoreşgeriyê da avakirin. Li Edeneyê ji aliyê xeleka kovara Hedefê (Armanc) ve bi siyaset û şoreşgeriyê hat naskirin ber bandora wê çêbû. Di sala 1989'an de dîlhat girtin. Piştî ku di Nîsana 1993'an de ji girtîgehê derket rojnameya Ozgur Gundemê (Rojeva Azad) destbi xebatên ragihandina azad dik e. Di rojnameyekî rojane de bû yekemîn jina
ku edîtorê rojnameyekê. Gurbetellî ku nêzî 6 mehan li Girtîgeha Bayrampaşa ya Stenbolê de ma. Di 16'ê Pûşbera 1994'an de hat berdan. Dema ku doz bi dawî dibe, 1 sal û 9 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn. Çekdarên PDK'ê li Çiyayê Garê di êrîşekî şerê xiyanetê de, 8'ê Cotmeha 1997'an de di êrîşa hovane de şehîd bû.

**Mazlum Erenci**

Di sala 1992'an de li Amedê ji dayik dibe. Dibistana navîn dema dixwend dest bi karê belavkirina rojnameya Azadiya Welat kir. Gelek caran di aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve gef lê hat xwarin. 14'ê Tîrmeha 2009'an de dema tevlî serhildanekî ji bona rakirina tecrîdê li ser Rêberê gelê Kurd Rêber Apo dibe tê binçavkirin. Ji ber tometa "endamtiya rêxistina PKK'ê" û " qaşo propagandaya Tevgera Azadiyê 4 sal û 2 meh ceza lê tê birîn. Mazlumê ku xwe dengdarê gelê xwe dît sala 2010'an berê xwe da çiyayên azad. Di pevçûna ku di 29'ê Hezîrana 2011'an de navbera gerilayên azadiyê û leşkerên dewleta Tirk ya dagirker de bejahiya navçeya Dersimê de rû da tevlî karwanên şehidan bûn.

**Rohat Aktaş**

Rohat Aktaş ku bi eslê xwe ji navçeya Pirsûsê ye, di sala 1997an de li Stenbolê ji dayik bûye. Ji ber zextên dewleta Tirk ya dagirker malbat koçî bajarên Tirkiyê dibe. Dema ku dibistana amadeyî dixwend, rojnameya kurdî a Azadiya Welat dinivîsand. Bû sernivîserê rojnameya Azadiya Welat. Ji navçeya Şirnex Cizîrê ku di 14'ê Kanûna 2015'an de qedexeya derketina derve hatibû ragihandin ji bona dengê rastiyê bigihine raya giştî bajêr de derneket. Aktaşê ku di nûçeyan de cih girt û dema hat qetilkirin rojnamegerek 19 salî bû. Di jêrzemînên qetlîamê de, tevlî karwanên şehîdan bûn.